

Xwendevanên birêz,

Em bang ji we dikan ku tiştên berdest di pirtûkxaneyê me da 14.000 temaşe biken:

- a. Pirtûkên (çîrokî û ne çîrokî)
- b. Pirtûkên taybet bo zarroyan û nûciwanan
- c. Jûrnal û govar
- d. Pirtûkên dengî
- e. Lîstik
- f. DVD / dîskên Blu-ray
- g. CD
- h. Pirtûkên perwerdehîya zimanê bîyanî
- i. E-pirtûkên

Herwisa em xizmetên jêr pêşkêş dikan:

- a. Bûyerên cûda
- b. Berdest bûna înternetê
- c. Xizmetê kopîyê
- d. Salonên xwandinê

Demjimêrên xebatê:

Rojên heftê	ji - heta
Duşem	
Sêşem	10.00-13.00 & 15.00-18.00
Çarşem	15.00-19.00
Pêncşem	15.00-18.00
În	15.00-18.00
Şeme	9.00-13.00
Yeşem	

Bi xêr bên bo pirtûkxaneyê me!

Koma pirtûkxanê

Mercên Bikaranînê

Ez dixwazim liser bikaranîna pirtûkxanê ji we re hinek zanyarîya pêşkêş bikem.

1. Qeydkirin

Qeydkirin tenê pê beşdarbûna şexsî pêk tê. Belgeyên pêwîst bo qeydkirinê:

- a. karta nasnameya wênedar

Pê îmza kirina ev peymanê ez radigehînim ku min şert û mercê kîrrê kirinê zanîne û min pejirandine û pê tomarkirina agahîyên xwe yê şexsî li gor zagonê heyî yê parastina agahîyan , qebûl dikem. Agahîyên şexsî yê bikarîner nakevîne berdestê kesê sêyem. Ev agahîyane bo lêkolîna kesê bikar nayên.

Bo qeydkirina zarrokên bin 14 sal yan jêrtir pêşkêş kirina izina nivîskî ya dêbava/serpereştê zagonî û gotinameya berpîrsîyê ku dêbava yan serpereşt vê îmza dike, pêwîste. Kesê înzaker qebûl dike ku destheq û xercê guhertina amrazên zirardîtî/ winadbûyî ji alîyek kesê kêmsal bide.

Paş qeydkirina karta beşdarbûnê tê ji bikarîner re bê dayîn ku bê vê dikare amûran ji pirtûkxaneyê kîrrê bigire, nabe karta endam bûnê ji kesek dî re bê veguhestin.

Guhertina nav û nîşanîya xwe ji mere rabigehînin. Eger kart ate wînda be, bilez gel pirtûkxanê pêwendîyê bigirin. Derxistina dubare ya kartê pê standina xercê pêwendîdar gengaze.

2. Kîrrê kirin

- a. Maweya kîrrê kirinê:

Tîpa medya yê	Maweya kîrrê kirinê
Pirtûk	4 heftan
CD	4 heftan
Dîska DVD / Blu-ray	4 heftan
E- Pirtûk	3 heftan
E-Dengî	2 heftan
E-kaxez	2 demjimêr

- b. Medyayê ku kîrrêdana wan ne gengaze (wek jêderên serçaveyên bêparê ferheng) hatine dîyar kirin.
- c. Hejmara babetên ku her bikarîner dikare kirê bigire Sînordare ji: Max. 20
- d. Bikarîner pêş derketina emrazên kîrrê ji pirtûkxanê divê wan tomar bike.
- e. Medya dibe tenê ji alîyê kêse kîrrêgir û bi hişyarî bêne bikar anîn. Herwisa, belav kirin, rûnivîs yan weşana giştî qedexeye.
- f. Eger rûnivîs bê girtin, berpirsîya girtina kopîyê ser milê bikraşnere. Rûnivîs kirina tevahîya rûperrê pirtûk, govar yan destê qedexe ye. Rûnivîs kirina medyayê dengî-wêneyî qedexe ye. Li dema rûnivîs kirina naverroka înternetî yan çap kirina vê, rêzgirtina mafê rûnivîs kirina kesên sêyem pêwîste.
- g. Bikarîner pêş derxistina emrazên kîrrê divê ewnan ji hêla hebûna kêmasîyên berçav û/yan kêmasîyê lêkolîn bike.
- h. Eger ji dezgeh, pel yan hafîzeyê elektronîkî ya bikarîner re bi sedema bikar anînê zirarr bigehîje, ji berpirsî liser milê pirtûkxanê nîne.
- i. Rêzgirtin ji maweya kîrrê pêwîste. Eger bikarîner tiştê kîrrê nezivirîne, tê cerîme be.
- j. Eger kesek dî ev tişt bo kîrrê daxwaza nekiri be, bikarîner dikare maweya kîrrê herîzêde heta 2 pê serdana pirtûkxanê yan pê telefonê, 07471-708274 yan bi rêya e-mail buecherei@bodenschulhaus.de berdewam bike. Maweya berdewam kirina kîrrê ji roja piştrastkirina berdewambûnê da destpê dike.
- k. Winda bûn yan xerap bûna tiştê kirê ji pirtûkxanê re rabigehîne. Xercê wan ser milê kirêgire. Eger ji destyekê tenê beşek wina be dibe kîrrêgir xercê giştê destyê bide. Nivîs xet kêşan yan dûşim kirina pirtûk yan medyayê dî jî zirarr tê hesabandin.
- l. Bikarîner xênjî xercê cêgir kirinê divê xercê veguhestin kirinê jî bide.
- m. Eger tiştê ku hûn daxwaza diken bi demekê berdest nebin, dikarin pê xerçek zêde wan rezerv biken.

3. Destheq û xerc:

I.	Xercê qeydkirinê	xerc
	Mezinsal	5,00 €
	Nûciwan 14-18 sal	--
	Zarrokê heta 14 salan	--
	Karta dubare derçûyî	2,50 € / 5,00 €
II.	Xercê rezerv kirinê	1,00 €
	Bo her bendê	
III.	Xercê bîrxistinê	
	1. bîrxer	1,00 € / 2,00 €
	2. bîrxer	3,00 € / 6,00 €
	3. bîrxer	5,00 € / 10,00 €

4. Bikaranîna înternetê

- a. Bikaranîna înternetê tenê bo kesê xwedî karta pirtûkxanê micaze. Zarrokên bin 14 salan yan kêmtir tenê pê izina dêbav yan serpereştê zagonî dikarin jê stîfade bikin.
- b. Pirtûkxane berpirs nîne liser naverok û berdestbûn yan kalîteya naverroka medyayê ku ji aliyê kesê sêyem pê derfetên pirtûkxanê hatîye belav kirin.
- c. Nabe sazîkirinê kompûterê bêne guhertin. Damezirandina sepanên bîyanî ku bikarîner tev xwe dîne yan daxîn dike, qedexe ye.
- d. Têketina nava malperê bi naverroka feşa, tûndî û/yan newekhevî yan handerê şidetê qedexe ye. Binpê kirina ev zagonane dibe sedema agadarkirinê. Binpêkirina berdewama zagona dibe sedema qedexe bûna bikarîner ji malperê înternet yan pirtûkxanê.

5. Zagonên Navxweyî

- a. Nabe kiryarra bikarînera bibe sedema nerazîbûna kesê dî di pirtûkxanê da.
- b. Zarrok di maweya nava pirtûkxanê da divê bin çavdêriya dêbavê xwe da bin.
- c. Kêşana cigareyê di pirtûkxanê da qedexeye.
- d. Xwarin û vexwarin di pirtûkxanê da tenê di cîyê taybet da serbeste.
- e. Bikaranîna telefona berîkan qedexe ye.
- f. Rêz girtin ji destûra endaman hertim pêwîste.
- g. Eger kesek bi berdewamî rêzikên bikaranînê yê pirtûkxanê binpê bike, rêveberîya pirtûkxanê dikare endambûna kesê tawanbar demekê bisekinîne yan betal bike.
- h. Pirtûkxane ser kin cyan emrazê we yê şexsî di pirtûkxanê da berpirs nîne.